

Komara wehşetê û dîsa jî îdam...

Kakşar Oremar

Email: kakshar_oremar@yahoo.de



Îro yekşemê (09. 05. 2010) sibê zû ji hêla berdevkê dadgeha bilinda Tehranê xebera îdama 5 girtiyên siyasî hate ragehandin. Ferzad Kemanger, Elî Heyderiyan, Ferhad Wekîlî, Şîrîn Elemhulî Atêşga û Mêhdî Îslamiyan îro sibê beriya hilatina tîrêjên rojê li girtîgeha Êvîn a Tehranê hatin îdamkirin. Beriya wê ne wekîl û ne jî kesek ji malbata wan kesên navbirî li ser karekî wiha nehatine xeberdarkirin. Li vira tê xuyanê ku biçuktirîn maf û hiqûqê insanî jî bo girtiyên siyasî li ber çav nehatiye girtin. Di prosesa dadgehkirinê da jî girtiyên Kurd nekarîn bi awayekî qanûnî û heta li gor bendên qanûna esasî ya Îranê xwe biparêzin.

Tevî ku hemû rêxistinên navnetewî yên ku li ser mafê mirova dixebitin, li dijî karekî wiha bûn û gelek hewl dan ku hukimê îdama wan neyê îcra kirin, lê rayedarên komara îslamî herkesê/a ku li dijî sîstema wan ya totalîter biçuktirîn pêngavê jî helîne, weke "dijiminê xudê li rû erdê" binav dike, tên tawanbar kirin û piştî şikence û îftrayên mezin, îdam dikin.

Girtiyên Kurd tev mirovên pozîtî û di civakê da xwedî bandoreke erênî û hurmeteke mezin bûn. Teisîra gotin û ramanên wan li ser gel pir hebû. Kesekî weke Ferzad Kemanger xwedî felsefêke homanîstî û kûr bû. Ji hemû komên êtinîkî hez dikir û azadî bi mafê hemû kesekî dizanî. Bawerim Şîrîn Elemhulî piştî Leyla Qasim keça duyê ye ku li rojhelata navîn bi tawaneke siyasî tê îdamkirin.



Rayedarên komara wehşetê bo rojek dirêjkirina temenê xwe yê teji kuştin û heqareta li dijî mafê mirovan, azadîxwazên Kurd îdam kirin. Lê ev mirin bi xwe ra jîyanê tîne û jidayikbûneke nû ye.

Azadîxwazên Kurd bo mafên xwe yên insanî û demokratîk ketin ser rêyekê ku rêya pêşkeftin û serxwebûna Kurdistanê ye. Hemû suçê wan "Kurdûn" a wan bû. Herwiha berxwedana wan û îsrara ku li ser domandina kar û xebatê siyasî li dijî sîstema totalîter hebûn, bûn sedema îdama wan.

Armanca komara Îranê (ku di nava raya giştî ya cîhanê da êdî wek "komara wehşt û îdamê" tê binavkirin), ji karên wiha hovane ra ewe ku gelê Kurd li rojhelatê Kurdistanê ji xebata siyasî dûr bike û bi karên wiha tirsekê di nava civakê da biafirîne. Lê ew ji



vê rastiye xafilin ku êdî ew roja wan ava bûye û êdî Kurda rêya xwe ya rastîn peyda kirine û bi hemû astengiyan ra di meşa xwe da berdewamin.

Herwiha ew dibînin ku di roja îro da rewşa Kurda di hêla xwe ya siyasî da li bakur û başurê Kurdistanê ber bi çareseriyekê ve diçe. Ev çareserî û bizava aktîv bandoreke rasterast li ser bizava siyasî ya Kurdên rojhelatê Kurdistanê jî datîne. Hovîtiyên komara îsmalî bidawî nabin. Ewê di rojên dahatî da dîsa girtiyên Kurd û Îranî îdam biken. Encama karên wiha di dawiyê da yê serê wan bixwe jî bixû û nîşanên ji holêrabûna rejîma wan çend sale ku li axa Kurdistanê û bi xebata nû ya PJAKê destpêkiriye.



Ew vê rastiye dibînin û ji ber wê jî hemû azadîxwazên Kurd zû îdam diken an jî di girtîgehên xwe da wenda diken.

Di girtîgehên Îranê da Ferzad Kemanger û hevalên xwe gelek hatin şikence kirin, rastî heqaret û nexweşiyem mezin hatin, ji wan hate daxwazkirin ku li ber kamireyên TVyê bêjin: " em poşmanin û me şaşî kirine...", lê wan qet dev ji doza xwe bernedan, weke şêra liberxwe dan û dilê dagîrkera bi gelê xwe xweş nekirin. Hertim bi evîna Kurd û Kurdistanê jiyân. Manîfestoya bîr û ramanên wan di wan nameyan da veşartîne ku di dirêjahiya sal û rojên jiyana xwe ya di girtîgehên reş da nivîsandin û pêşkêşî dîroka azadîxwaziyê kirin.

Elmaniya 09. 05. 2010